

Zanyariyên Dawîn ser Koronayê Bo Koçberên Nû li Taxa Konstanz'ê

Wekî ji: 08.05.2020

Ji kerema xwe van zanyariyan bi hemû kesên pêwendiya xwe li taxê re bi par ve bikin. Em dizanin ku ev bo her kesî rewşeke dijwar e û em bo têgihîştin, bêhnfirehî û piştevaniya we di belavkirina zanyariyan de sipasiya we dikin. Em di vê belgeya "Zanyariyên Niha yê Koronayê" de we ser kiryar û guherînên niha agahdar dikin. Di belgeya FAQ – Kesên nûhatî bersiva pirsên zêde tên kirin li [vir dane](#).

Erkdariya lêdana devpêçan

Ji roja 27.04.2020 ve, hemû kesên ji 6 saletiyê jortir ve **divê dema kurrînê û siwarbûna veguhestina giştî (otobûs û trenê) devpêçan lêdin**. Gerek e dev û pozê xwe bi devpêçeke (xweçêkirî) wek mînak bi perçe yan destmalê, bipêçin. Hûn dikarin zanyariyên pirtir ser devpêça neçarî bi çendzimanan [li vir peyda bikin](#).

Qedexeya pêwendiyê û destûrên dûrbûnê:

Pêwendiya ferdî yê taybet hîn jî heya qaseke gelekî kêr dikarin pêk werin. Herwiha, renga mirov di cihên giştî de cot be yan endamin jin malbata xwe re be. Lê, ji niha ve dîsan destûr heye endamên ji du malbatên cuda (wek mînak, du malbat, du hevapartimanî, û hwd.) li cihên giştî hevdu bibînin.

Dûrbûna **herî kêr a 1.5 metroyî** hîn jî divê her derê were raçavkirin!

Civînen li odayên taybet **bi ji 5 kesan pirtir** hîn jî qedexe ne.

Muqatebûna zarokan û perwerde:

Dibistan dê bi gelemperî herî kêr heya roja 15.06.2020 girtî bimînin (piştî betlaneya Pentecost). Dîsan vebûna hêdî hêdî ya dibistanan di rê de ye:

- Xwendekarên di **klasên kutabûnê** yê perwerdeya giştîku îsal kuta dikin yan sala din dikarin dîsan ji 4 meha Gulanê 2020'î ve beşdarî klasan bibin.
- Xwendekarên di **klasên ezmûnan li dibistanên pêşeyî de** jî ji **04.05.2020** destûra wan hatiye dayîn.
- **Zarokên dibistana seretayî li pola çarem** ji **18.05.2020** ve dikarin bo demjimêrên kêmsînor vegerin dibistanê.

- **Ji 15.06.2020 (piştî betlaneya Pentecost)**, hemû xwendekar divê herî kêr bi awayê demkî biçin dibistanê. Hînkirina li dibistanê (beşdarbûna li klasan) divê bi hînbûna li malê re bibe yek.
- **Ji 15.06.2020**, bo **xwendekarên dibistanên pêşeyî** divê dersên carcarî jî hebin.

Zarokistan û cihên muqatebûna rojane (Kita) dê herî kêr heya 15.06.2020 girtî bimînin. Hin zarok bo muqatebûna lezgîn **tên pejirandin**. Ev tenê bo zarokên pola 7em û jortir e. Tenê ew zarok dikarin bi kar bin ku karê dayîkbavên wan yan serperestên wan ên qanûnî arîkariyê dide xwedîkirina jêrsaziyên girîng (wek mînak, bijîşk, efserên polîs, û hwd.) yan kesên ku nikarin karê xwe ji malê bikin û gerek e ser kar bin.

Hûn dikarin zanyariyên pirtir ser muqatebûna lezgîn û çawan tomarkirina zaroka xwe ji şaredariya cihê jiyana xwe û/yan ji cihê muqatebûna rojane ya zaroka xwe yan dibistanê wergirin.

Ji **18.05.2020** ve, muqatebûna rojane li cihê muqatebûna rojane (Kita) divê bo heya 50%zarokan were berfirehkirin.

Cihên giştî yê lîstinê renga dîsan vebibin. Rayedarên xwechî biryar didin kîjan cihê lîstinê û kingê vebibe.

Zanîngeh û kolêjên teknîkî dê heya 10.05.2020 girtî bimînin. Terma havînê ya Zanîngeha Konstanz'ê û HTWG Konstanz'ê wekî piraniya zanîngehên li Almaniyayê li meha Nîsanê bi awayê dijîtal dest pê bûn û di dirêjahiya termê de yê internetî bin. Wekî ji 14 meha ..., 2020'ê ve, **Pirtûkxaneya Zanîngehê** dê bikare bo dayîna berhemên ku ji berê vebî internetî sipariş bûne vekirî be. Lê, pirtûkxane wekî cihekî fîzîkî yê hînbûnê niha girtî dimîne.

Kursên zimên renga li gor destûrên rîjd ên paqijiyê ji 04.05.2020 ve werin lidarxistin. Pêdiviya gelek pêkhîneran bi dema zêde heye ku destûran pêk bin û loma roja 04.05.2020 rasterast venakin. Pêkhînerên kursan serdîsan destpêbûna ferdî ya kursan û destûrên zêde yê têkildar xwendekarên xwe agahdar dikin.

Dîn:

Mizgeft, kilîse û kenîse dikarin dîsan vebibin. Lê, kiryarên rîjd ên Peymana Parastina hemberî Tûşbûnê, wekî raşavkirina dîrbûna herî kêr û negotina stranên dînî bi kar tên. Her kilîse bixwe biryar dide veke yan destûrên rijdtir bisepîne.

Gerr û sefer:

Serdan û sefer divê heya mimkin neyên kirin. Gelek sînorên ewropî hîn jî girtî ne. Sînorên derve yê Ewropayê (devera Schengen'ê) ji 17.03.2020 ve girtî ne. Nivîsgeha Biyanî ya Federal hişdariya xwe dijî sefera navneteweyî herî kêr heya 14 Hezîranê dirêj kiriye.

Veguhestina giştî: Xizmetên tren û otobûsan hîn jî heya radeyekê kêmsînor in. Hûn dikarin zanyariyan ser malperên [VHB](#) û [Stadtwerke](#) Konstanz wergirin.

Kirrîn, jiyana rojane û sergermî

Ji niha ve **hemû firoşgeh** dikarin dîsan vekin. Destûrên devpêç û dûrbûnê divê werin raçavkirin.

Salonên porrhildana jinan û muqatebûna piyan jî dikarin li gor mercên gelekî riid vebibin.

Dibistanên ajokariyê dikarin dîsan ji 11.05.2020 ve li gor destûrên riid vebibin.

Ajalxane, baxên gihanasiyê, kevnarxane, galerî û cihên bîranînê dikarin ji 06.05.2020ve vebibin.

Xizmetên rayedaran û civakî:

Hevdîtînen li nivîsgeha deverê (Landratsamt)

Hemû nivîsgehên nivîsgeha deverê vekirî dimînin. Lê ketina nava avahiyan tenê bi hevdîtinas diyarbûyî mimkin e. Hevdîtînen kêmsînorî wan mijaran in ku pêdiviya wan bi serdana ferdî heye. Hûn dikarin bi telefonê yan e-nameyê jî bi nivîsgehan re pêwendiyê çêbikin.

Bo hevdîtînen ferdî li nivîsgehan, devpêç gerek e û divê dûrbûna 1.5 metroyî raçav bibe.

Qedexeya ketina nava avahiyên hevbeş

Avahiyên hevbeş li deverê bo parastina niştecihan heya 15.06.2020 ji hemû kesên serdanê bikin re girtî ne. Tenê niştecihên li wir dijîn û karmendên nivîsgeha deverê dikarin biçin wir. Eger kesek vê qedexeyê raçav neke dê pêşîf were girtin.

Yarmetiyên civakî

Nivîsgeha Deverê (Landratsamt) / Nivîsgeha bo Koçberan û Tevlêbûnê:

Hûn dikarin bo mijarên girîng û bi hevdîtîna ji pêş ve diyarbûyî serdana Beşa Xizmetan a Nivîsgeha bo Koçberan û Tevlêbûnê bikin. Eger pirsên we hebin, ji kerema xwe bi telefonê yan e-nameyê bi birêveberê xwe re pêwendiyê çêbikin. Hûn dikarin belgeyên girîng jî bişînin ami-leistungen@LRAKN.de.

Devera Jobcenter'ê ya Konstanz'ê:

Hemû hevdîtînen beriya koronavayrusê betal in. Dirav dê wekî asayî were veguhestin. Hûn ê bi hevdîtînen betalbûyî ji tiştan bêpar nebin.

Hûn ê ji BAMF nasbûnê wergirin û bo vê sebebê jî hûn ê cara yekem ji Jobcenter / Navenda kar dirêv wergirin, gerek nake hûn werin Jobcenter. Hûn ê xwe bi xwe ji destpêka meha tê ve ji Navenda kar dirêv wergirin.

Hûn dikarin wekî caran bi hejmara 07531 36336-0 yan bi rêya e-nameyê bi Jobcenter'ê re pêwendiyê çêbikin jobcenter-landkreis-konstanz@jobcenter-ge.de. Bo mijarên lezgîn, hûn dikarin bi rêya xeta taybet a 07531 36336-800 bi Jobcenter'a devera xwe re pêwendiyê çêbikin.

Ajansa karsaziyê (Arbeitsagentur):

Hemû hevdîtînen beriya koronayê betal in û demên dawîn jî niha taloqe bûne. Hûn ji tu tiştên hevdîtînen betalbûyî zîyanê nebînin.

Hûn dikarin bi rêya xeta taybet a 07531 - 585 700 bi Arbeitsagentur re pêwendiyê çêbikin.

Sêwirmendiya civakî û piştevanî:

Sêwirmendiya civakî bo penaber û koçberan

Xizmetên civakî li avahiyên hevbeş, birêveberiya tevlêbûnê û navendên şîretan ên koçberiyê hîn jî dikarin bi e-name û telefonê pêk werin. Di mijarên lezgîn de û piştî diyarkirinê ji pêş ve bi telefonê, sêwirmendiyên ferdî jî mimkin in.

Xeta taybet a nivîsgeha rifaha ciwanan (Jugendamt)

Rewşa niha astengiyê mezin bo gelek dayîkbavan e. Jugendamt demjimêreke dilxwazî ya sêwirmendiya telefonî bo dayîkbavan pêşiyar dike. Ew dikarin bi telefonkirina ji **07531 800-3211 or -3311** re arîkarî û şîretên perwerdeyî wergirin. Demjimêrên sêwirmendiyê ji 10 heya 12 li rojên duşemî, çarşemî û înnî, ji 14 heya 16 li rojên sêşemî û pêncşemî ye.

Xeta taybet a arîkariya strêsa mêjî

Saziya vivo international e.V. û Zanîngeha Konstanz'ê sêwirmendî û piştevaniya demkî ya telefonî bo kesên revyayî pêşkêş dike ku xwe westyayî, bêçare, xemgîn, tenê, bêxew, bêhêvî û hincaran divan demên dijwar de xwe ji hêla derûnî ve serbar dizanin, pêşkêş dikin. Hûn dikarin zanyariyên pirtir [li vir peyda bikin](#).

Kesên êşdîtî dikarin bi xeta arîkariyê **07531 883207** ji duşemî heya înnî ji demjimêrên 9-12 arîkariyê wergirin.

Xeta taybet a qanûna kar

Navenda şîretan a "Tevlêbûna Minasib" ser mijara koronayê û qanûna kar heya herî kêr 30 Gulanê şîretên çend zimanî yê telefonî dide. Ev şîret bi Erebbî, Derî, Tîgrînî, Tirkî, Rûsî, Spanî, Japonî, Inglîsî û Almanî ne. Hûn dikarin zanyariyên pirtir û hejmarên telefonê yê têkildar li [vir peyda bikin](#).

Serdanên bijîşkan, muqatebûna bijîşkî û zanyariyên ser koronayê:

Serdanên bijîşkan û dermandayîn

Eger nîşaneyên we yê sar hebin, hûn divê hîn jî bêyî agahdarkirin serdana bijîşkê malbatê nekin. Hûn gerek ji pêş ve ji nivîsgeha bijîşk re [telefon bikin](#). Eger pêdiviya

we bi dermanên nusxeyan hebin (wek mînak, ensulîn), ji bijîşkê malbatê bipirsin ka pêdiviya we bi dermanên li dermanfiroşiyên heye yan na û daxwaz nusxeyê bikin.

Korona-Xeta taybet

Landratsamt Konstanz bo welatîyên ku şîretan ser koronavayrusê dixwazin xeteke taybet daniye. Ew nava demjimêrên 8 û 18 ji duşemî heya înrî û ji demjimêrên 8 heya 14 li rojên şemî bi telefona 07531 800-7777 heye.

Reftara li awayên gumanbar

Zanyariyên çend zimanî ser reftarê dikarin [li vir peyda bikin](#).

Zanyariyên pirtir ên çend zimanî ser Koronayê

- Beşa Tevlêbûnê
https://www.Irakn.de/integration_Lde/mehrsprachige+informationen+zu+corona
- Komîsyonerê Federal bo Tevlêbûnê:
Rûpela sereke <https://www.integrationsbeauftragte.de/ib-de/amt-und-person/informationen-zum-coronavirus>
Instagram: <https://www.instagram.com/p/B9zdgEckUvW/>
Twitter: <https://twitter.com/IntegrationBund/status/1239595687907594249>